## Pêşxistina jêhatîbûna giştî û hunerî

Pêşxistina qabîliyeta giştî û hunerî livûtevgerên tevahiya bedenê dide ber xwe, bo nimûne çûna bi çaplûkan, bazdan, xweragirtina bi denge, hilkişîn û herwiha livûtevgerên ku em bi dest û tiliyên xwe pêk tînin, mesela; boyaxkirin, wêne çêkirin.

## Zanîna bi hişmendî

Zanîna bi hişmendî meraq û livûtevgera keşfê ya zarok teşwîq dike, wekî din biryardariya zarok a di livûtevgerekê de bi pêş dixe. Zarok dibe xwedî zanînên giştî yên li gorî temenê xwe, bo nimûne têgihîştina ji rengan, forman û çendeyan. Wekî din, stratejiyên çareseriyê yên musaît û pevgirêdanên aqilane tên bipêşxistin.

## Pêşketina ziman

Pêşxistina zimên hemû cureyên ragihandinê dide ber xwe, mesela: danûstandina rû bi rû, liva dest û endamên din ên bedenê, îfadeyên rûyî, destpêkirina axaftinê, fêrbûna peyvan, fêmkirina ji zimên, bilêvekirina peyvan û coşa axaftinê..

## Civakî-kelecanî

ji bo zeximkirina pêşketina civakî-kelecanî, bi tecrubeyên erênî bi xwe baweriya zarokan tê xurtkirin. Zarok fêrî xweragirtina li hestên cihêreng ên weke şadî, hêrs û tirsê, tê kirin. Bi danûstandina li gel zarokên din, ew fêrî lîstinê, çareserkirina pirsgirêkan, îfadekirina pêwistiyên xwe û îdarekirina wan dibe.




FRÜHFÖRDER ZENTRUM

Bildnachweis: www.pexels.com

# Destwerdana zû çi ye?

Kurdisch



Destwerdana zû tê wateya eleqedarbûna bi rewşa pêşketina ferdî ya zarokan, çîroka jiyana wan û rewşa malbata wan re. Piştgirî xwe dispêre asta pêşkeftina zarokan û karîna wan a ferdî. Armanca destwerdana zû ew e ku hêz û çavkaniyên heyî kifş bike, berfireh bike û bi pêş ve bibe.

Armanca destwerdana zû ew e ku rê bigire li ber astengiyên heyî yan jî nêz, da ku zarok karibe tevlî jiyana rojane bibe, derfetê bidê da ku kesayetiya xwe û qabîliyetên xwe yên ferdî bi pêş bixe.

Armanceke bingehîn entegrekirina zarok li nava cîhana zarokan e.

Bi hevkariya navbera pisporan û dêwbavan, ji bo zarok bipêşkevin, pêşniyarên ji bo sererastkirina jiyana wan a li nava malbatê tên kirin. Ev yek, ancax dema malbat tevlî pêvajoya destekê dibe, mumkun e.

La durée, le cadre et la fréquence hebdomadaire des unités de soutien dépendent individuellement des besoins de l'enfant et des options des parents.

Destwerdana zû şîret û desteka dêwbavan ên ji bo qonaxa pêşketinê, rewşên xweser ên pêşketinê û pêdiviyên pêşketinê yên zarokan dide ber xwe. Destwerdana zû zarok û malbatê yekpare dibîne û dixwaze di hemû qonaxên pêşketina zarok de bi hev re bin.

Yekîneyên destekê heftiyê çend caran di kîjan çarçoveyê de heta kengê wê bên cem hev? Bersiva van pirsan girêdayî pêdiviya zarok û tercîhên dêwbavan e.

Lîstika perwerdeya şîfakar bingeha têgihîştina yekîneyên destekê pêk tîne. Bi saya gelek teşwîqên destekê, hin zanîn, qabîliyet û karînên nû derdikevin holê, bi pêş dikevin û di lîstikê de tên zeximkirin. Divê zarok li nava atmosfereke dilovan û rêzgir bilîze. Armanc teşwîqkirina mirovan e ji bo ew jî bikevin nava livûtevgerê û karibin derdora xwe ya mirovî û madî îdare bikin.



Qadên pêşketinê yên dikarin bên destekkirin bi awayekî ferdî û li gorî rewşa zarokan bên sererastkirin:

## Pêjinkirina di hemû warên hîsî de

Zarok bi herkesî re fêrî pêjinkirin û têderxistina îşaretên cuda yên hişyariyê dibe bi têgihîştin û bikaranîna dibe, bi bikaranîna hemû hestên xwe (dîtin, hîskirin, bihîstin, ûhwd.)

## Pêşxistina lîstikan

Ji bo destekkirina pêşxistina lîstikê, gelek lîstikên ferdî yên li gorî temenên wan pêşkêşî zarokan tên kirin da ku wêrekiya wan a lîstinê were zêdekirin.